Ciwan pêşeroj e, pêşeroj sosyalîzm e

# BERBANG

Biha: 1000

Hezîran 2024 Hejmar: 01

## DI RÊYA ZÎLANAN DE BER BI SERKEFTINÊ VE



# DI RÊYA ELENDEYAN DA EM Ê ZÎLANAN BIAFIRÎNIN

Berbang, tîrêjên pêşerojê ji asoya Şoreşa Rojava belavî Rojhilata Navîn dike. Ew ronahîya sosyalîzmê di nav girseyên ciwanên Rojavayê Kurdistanê û Bakur Rojhilatê Surîyê da geş dike. Di têkoşîna azadî û sosyalîzmê da, di lêgerîna wekhevî û azadîyê da rê nîşanî ciwanan dide, ala Komunîstên Şoreşger bilind dike. Ji bo edaleta civakî û wekhevîya zayendî dibe dengê ciwan û jinên ciwan ên karker, kedkar û xwendevan. Berbang, hejmara xwe ya 1emîn, di şexsê hevrê Zîlan Destan da dîyarî hemû nemirên şoreşê dike.

Şoreşa me ya ku sala xwe ya 13 temam dike, di pêvajoya hilweşîna dîktatorên Rojhilata Navîn da, ango di pêvajoya bihara Ereban da li Rojavayê Kurdistanê dest pê kir. Ji gava destpêkê ve me wek jin û xortên ciwan pêşengî ji şoreşê ra kir; Parastina welatê xwe weke karê sereke danî pêşîya xwe. Di nav artêşa şoreşê da, di nav refên YPG û YPJê da, li hemberî tarîtîya çeteyan û dewletên mêtinger bi xwîna xwe destanên lêhengîyê nivîsand. Her wiha li gel parastinê, avakirina sazîyan û jiyana aborî jî li ser milê ciwanên şoreşê ye; û ciwan heta niha jî ji artêşê heta sazî û kargehan, di her warî da barê şoreşê radikin. Lê, li gel van qas berdel û kedên ku hatine dayîn jî îro di nav ciwanên şoreşa me da hişbir û koçberî wek nexweşîyekê belav dibe. Nifşên ku zarokê şoreşê bûn, ji şoreşê dûr dikevin û dikevin pê azadîyeka burjuva û jîyaneka kapîtalîst. Bêgûman em nikarin vê rewşê yek bi yek di hevalên xwe yên ciwan de mehkûm bikin û wan sûcdar bikin. Ji bona ku em ji van pirsgirêkên şoreşa xwe re çareserîyên rast bibînin, pêwîst e em sedemên van pirsgirêkan rast bibînin û şirove bikin. Li ser axên şoreşa ma (her çiqasî di herêman da cudahî hebin jî) pergaleka civakî a derbasbûnê tê jiyîn. Têkilîyên ku em weke "têkiliyên eşîrtîyê" bi nav dikin, weke bermahîyên feodalîzmê di nav civaka me da didomin. Sedema vê ya sereke jî ev e ku hîna piranîya civaka me li ser çandinîyê debara xwe dike; sala ku debr (musim) baş e gel piçek din hêsanîyê dibîne. Ango bi axa xwe ve, bi eşîra xwe ve bi vî rengî girêdayî ye. Lê li gel vê jî burjuvazîya bazirganîyê her ku diçe xurt dibe û têkilîyên civakî di asteka ruxîner de diguherîne. Çanda burjuvazîya lîberal û burjuvazîya biçûk di nav girseyên ciwan û jinên ciwan da her ku diçe bandora xwe zêdetir dike, xwişk û birayên me dixe bin bandora xwe. Di milekî da feqîrtîya ku kûr dibe, têkilîyên aborî yên ji feodalîzmê ber bi kapîtalîzmê ve diguherin û di milê din da jî çand û hegemonyaya kapîtalîzmê ku di nav ciwanan da belav dibe, wêneyê şoreşa me ya îro derdixe holê. Zarokên şoreşa Rojava, ku bi hezaran şoreşger ji her derê cîhanê ji bo pêşeroja wan hatin û xwîna xwe dan vê şoreşê, îro dev ji şoreşa xwe ango pêşeroja xwe berdidin û direvin ji derveyî welat. Li gel vê jî, dewleta mêtinger û dagirker a burjuvazîya Tirk, hem bi êrîşên erdî û hewaî, bi gefên xwe yên li ser şoreşgeran û binesazîya şoreşê, hem jî bi êrîşên çandî-exlaqî-bîrdozî şerekî taybet li ser şoreşa me dimeşîne. Pêşî li avakirina derfetên kar digire, hevalên me bi hişbirê, bi lêgerîna jiyaneka "xweş" ji rastîya jîyanê, ji şoreş û têkoşînê dûr dixîne. Pergala kapîtalîst ya cîhanî, ciwanan bi azadîya kesayetî, bi rizgarîya ferdî dixapîne; lê çawa em bê civak nikarin bijîn, em bi tena xwe nikarin azad jî bibin, rizgar jî. Ciwanên şoreşê derfetên di destê xwe da, hêza di destê xwe da nabînin. Jinên ciwan ji hêz û girîngîya xwe bê agahî ne. Dijminên şoreşa ma, bi motor û têlefonan, bi hişbir û koçberîyê, bi hezkirin û têkilîyên direw ciwanên şoreşê, xwişk û birayên me, hevalên me dixapîne û ji rojevên sereke yên şoreşê dûr dixîne. Û ev jî li ser bingeha maddî ya ku me li jor behsê kirî; civaka derbasbûnê ango civaka kapîtalîzma paşvemayî çêdibe.

Pêwîst dike ku em ji niha da bêjin; yê ku welatan ava dikin,



xweş dikin, mirovên wî welatî, bi taybetî jî ciwanên wî welatî ne. Ji ber vê yekê, ligel hemû kêmanî û bê derfetîyan jî, cihekî ku ji welatê me xweştir û azadtir tune ye. Ji ber ku em nikarin welatên cuda biguherin, herî zêde em dikarin ji wan ra bibin kole; karker û leşger. Ev ne jiyaneka bi rûmet e. Lê em li ser axa xwe, xwedîyên vê şoreşê ne. Her tiştê ku em rexne dikin, hêza me heye ku em biguherin. Baş e, em ê vê hêzê çawa derxînin holê, em ê çawa hêza xwe bibînin? Fermandarê Sor Baran Serhed digot; " Em jê bawer in ku; vîneka ku bi armancê ve girêdayî dikare her tiştî bi ser bixe." Baş e, lê vîna bi armancê ve girêdayî wê çawa derkeve holê?

Elende el Muhemed, yek ji avakerên vîna bi armancê ve girêdayî bû. Wê têkiliyên xwe bi jîyan û civaka xwe ra guhert. Girêdayînên xwe bi jîyan û çanda feodal re qut kir. Ji bajarekî wekî Kobanê, ku têkilîyên eşîrtîyê pir xurt in, derket û berê xwe da jîyaneka nû. Wê dizanîbû ku jîyaneka çawa dixwaze û dê ev jîyan çawa bê avakirin. Ew êdî Zîlan Destan bû. Bêtirs û bibawerî berê xwe da têkoşînê. Hêza wê ya qutbûnê, bû bingeha pêşketin û azadîya wê. Dilsozîya wê ya bi armancê ve, girêdayîna wê bi partîyê ra bû hêza wê. Wê zanîbû ku pêşerojê xeyal bike û xeyalên xwe ava bike. Tiştên ku ciwanên din jê gazinan dikin, an jî jinên ciwan nikarin xeyal jî bikin di jîyana xwe da pêk anî. Weke jineka ciwan ji nav têkîlîya malbateka Kobanê derket û bi vê hêzê Zîlan afirand. Azadîya xwe bi xwe stand, bi keda xwe bû pêşenga Ciwanên Komunîst ên Şoreşger. Bi vîn û dilsozîya xwe ya bîrdozî, xwe pêş xist; perwerde dît û xwend. Hevrê Zîlan îro bang li me dike û dibêje ku; jîyaneka wekhev û birûmet, civakeka azad û bi edalet xeyal bikin. Û ji bo pêkanîna xeyalên xwe dest bi têkoşînê bikin.

Çawa ku em dibêjin "Ciwan Pêşeroj e, Pêşeroj sosyalîzm e", pêwîst e em xwe ji pêşerojê ra amade bikin. Li hemberî şer û êrîşên ku hîna berdewam dikin, ji bo parastina şoreşê xwe rêxistin bikin. Ji bo rêvebirina şoreşê, çareserkirina pirsgirêkên şoreşê di nav rêxistinên xwe de xwe pêş bixin. Xwişk û birano, jin û xortên ciwan; sînorên ku bermahîyên civaka feodal li ber we datîne û azadîya direw a sîstema kapîtalîst datîne pêşiya we parçe bikin û bavêjin! Ne çanda eşîrtîyê ku me ji mirov nahesibîne û tu mafê me qebûl nake, me bi rolên jintîya kevneşop û serdestîya mêr di nav civakê da cih dike; ne jî azadîya burjuva ya ku jîyanê vedigerînê bazarekê û me jî wek tiştê firotinê tê de bi cih dike û her tiştî dike berjewendî, qebûl nekin! Azadîya ma di hêza me ya rêxistinkirî da ye, pêşeroja me li welatê me, di sosyalîzmê da ye. Me ji Elendeyan, Zîlan Destan afirand, em ê bibin Zîlanên nû. Em bi mezinkirina rêxistina xwe, dikarin derfetên têkoşînê zêdetir bikin û serkeftinê amade bikin. ji ber vê yekê, em CKŞê mezin bikin û ji kargehan heta zanîngehan di nav tevahîya ciwanên şoreşê da belav bikin. Serkeftin teqez e, ji ber ku em pêşeroj in!



# EM Ê BI KEDA CIWANAN TEQEZ DIJMIN TÊK BIBIN

Civaka Rojhilata Navîn li ser çanda eşîrtî teşe digire. Ciwan jî piranî bi çanda eşîret ve girêdayî ne. Jîyana ciwanan bi çand û biryara wê tê kontrolkirin. Em dikarin bibêjin ku eşîr malbateka mezin e. Ji bo vê yekê çi jin be, çi mêr be, çi jî xort be tu kes nikare li ser jîyana xwe biryar bide. Biryara li ser jîyanê, edet û teqelîd ji alîyê malbat an jî eşîrê ve tê eyarkirin û ev weke zagon li ser mirov û civakê tê ferzkirin. Em ji vê yekê ra dikarin bêjin azadîya bi zincîr an jî zindaneka vekirî.
Berî destpêkirina serhildanên gelê Ereb ên 2010an ku weke "Bihara Ereban" tê nasîn ciwanên Rojhilata Navîn di bin şertên gelekî zor û zehmet da dijîyan. Her çiqasî ku bixwînin jî ji ber bêkarîya girseyî û aborîya lawaz ji bilî intiharê tu rê li ber wan nîn bû. Di bin dîktatorîyên 30-40 salan ji mafên aborî, civakî û sîyasî bêpar dijîyan. Astengî û zextên gelekî mezin li ber ciwanên ku dixwastin li hemberî vê têbikoşin dihatin derxistin. Dengê ciwanên ku her dixwastin van mijaran bikin rojev û dengê xwe li ser ragihandin bidin bîhistin dihat birîn.

Lê ev rewş êdî gîhaştibû asteka ku nayê qebûlkirin. Li dijî vê rewşê li Tunisê ciwanê bi navê Mihemed bazûzîyê ku zanîngeh xwendibû û bêkar bû agir bi bedena xwe xist. Agirê bedena Mihemed Bazûzî li dijî zilm û zordestîya dîktatorîyên Rojhilata Navîn bû sembola têkoşîna azadîyê. Mihemed Bazûzî wekî ciwanekî Ereb ev jîyana koletîyê qebûl nekir û bi agirê bedena xwe bû pêşengê hezaran ciwanan. Agirê vê serhildanê berê xwe da tevahî welatên Rojhilata Navîn. Di her welatekî da dengê serhildanên ku bi pêşengtîya ciwan û jinan mezin bû di tevahî cîhanê da deng veda.

Bandora serhildanên gelên Ereb ku dizivire teqîneka civakî piştî demeka kin digîhêje Sûrî jî. Bi bandora van serhildanan li Dera ciwanekî bi navê Hemze El Xetîp li dijî faşîzma BAAS serî hildide û li ser dîwaran dirûşmeya "AZADÎ" dinexişîne. Piştî vê Hemze El Xetîp ji alîyê rejîma BAAS ve tê binçavkirin û di bin çavan da rastî şkenceyên giran tê û jîyana xwe ji dest dide.

Li ser vê mijarê di destpêkê da gelê Derayê derdikeve kolanan û li dijî rejîma BAAS dest bi çalakîyan dikin. Çalakî belavî gelek bajarên Sûrî dibe. Rejîma Esad a faşîst li her derê êrîşa gel dike. Wekî bajarên din li bajarên Rojavayê Kurdistanê jî çalakî destpê dikin. Bi hezaran ciwanên Rojava yên ku dîroka serhildana 2004an nû dikin, bi hêrsê pirskirina hesabê komkujîya Qamişlo dest bi serhildanan dikin. Gelê Rojava bi pêşengtîya ciwan û jinan ji bo hilweşandina pergala BAAS a faşîst bi dirûşmeyên azadî dadikevin qadan.

Di vê şoreşê da bi hezaran ciwan bi cihgirtina di refên herî pêş da li dijî faşîstan bûn mertal. Gelê Rojava ji bo ku destkeftinên vê şoreşê misoger bike bi hezaran zarokên xwe fida kirin. Lê dewletên emperyalîst û bi taybetî dewleta Tirk a faşîst û mêtînger xwestin vîna şoreşê bişkînin. Ji ber vê yekê di alîyekî da bi destê komên çeteyan, di alîyê din da armanca şkenandina vîna ciwanan rêbaza şerê taybet û şerê nefsî dan meşandin.

Lê di her kêlîyê da ciwanên vê xakê bi cesaret û fidakirina canê xwe li dijî dijmin bûn bersiveka xurt. Di hundirê şoreşê da gelek mînakên lêhengtîya ciwanan hat jîyîn û ciwan bi têkoşîn û fidatîya xwe bûn rûpeleka zêrîn a dîroka şoreşê. Di her berxwedanekê da keda ciwanan derket pêş, bizirên rih û manewîyata ciwanan hate çandin. Di berxwedana Kobanê da bi hezaran ciwanên Bakurê Kurdistanê û Tirkîye xwe li sînoran xistin û derbasî Kobanê bûn. Ew sekna pîroz a ciwanên Kurd û ciwanên ji gelên Tirkîye sînorên mêtingerîyê yên parçekirina Kurdistanê şkand.

Em careke din ciwanên ku di berxwedana Kobanê da canê xwe fidakirin bi bîr tînin. Di heman demê da di dîroka 2015an da ciwanên sosyalîst ên ku di bin navê "Federasyona Komeleyên Ciwanên Sosyalîst" da rêxistinkirîbûn xwestin ku di şexsê Kobanê da xwedî li şoreşa Rojava derkevin. Bi dirûşmeya "Me bi hev ra parast em ê bi hev ra ava bikin" di tevahî bajarênTirkîye û Bakurê Kurdistanê da hamleyek dan destpêkirin. Di 20ê Tirmehê da ji bo derbasbûna Kobanê li Pirsûsê kombûn. Lê bi destê istixbarata Tirk û DAÎŞê di nav Ciwanên Sosyalîst êrîşa bombeya zindî çêbû. Di vê komkujîyê da 33ê ciwan şehîd ketin û bi sedan kes birîndar bû. Di nav 33ê ciwanên şehîd da ciwanên Kurd, Tirk, Ereb, Çerkez, Laz, Ermen-Hemşîn, Elewî û hwd. hebûn. Ji ber vê yekê em dibêjin dê xewn û xeyalên wan nîvçe nemînin. Di nav van da ciwanên karker, xwendekar, parêzer, endezyar,

mamoste, hunermend, wênesaz, werjîşkar hebûn. Me di encama komkujîya Pirsûsê da 33ê hevalên xwe oxir kir. Di heman rojê de li 12 bajaran bi tevlîbûna 10 hezaran merasîmên şehîdan hatin lidarxistin. Ev dîroka ku bi destanan hatîye nivîsandin ji bo naskirina sîyaseta dewletên mêtinger hêjaye ku em weke ciwan baş bixwînin û ji dîroka têkoşîna xwe hêz û bawerî bigirin.

Di sala 2015an da li Amedê bi pêşengtîya ciwanên Kurd destana Sûrê hat nivîsandin. Berxwedana ku weke "Berxwedanên Rêveberîya Cewherî" hat binavkirin di bin fermandarîya şehîd Çîyager da bi lêhengîya 60 ciwanên Kurd ket rûpela dîrokê. Gotina fermandar Çîyager a "Çi dibe bila bibe wê encam muhteşem be" tirseka mezin berda dilê dijmin û rê ji berxedanên ciwanên Ferqîn, Nisêbîn, Şirneq, Cizîr û hwd. vekir.

Ji her milî da dengê ciwanan tê. Ev deng her diçe geş dibe weke tembûreka di welatekî birîndar da dibe nîşana serkeftinê. Ji Efrîn heta Şengal, ji Kobanê heta Serê Kanîyê û Girê Sipî û hwd. me weke ciwan bedelên giran spartin vê xakê. Em ji bîr nekin ku bi hezaran ciwanan li hemberî DAÎŞê şer kirin. Reqaya ku weke paytexta DAÎŞê dihat nasîn hat hejandin. DAÎŞ li Baxozê li hemberî vîn û bawerîya ciwanan têk çû. Dîsa weke ciwanên komunîst me di şerê Reqeyê da lêhengeka ciwan hevrê Destan Temûz şehîd da. Di şerê Minbic da hevrê Raperîn Dîcle, di şerê Kobanê de hevrêyên me yên ciwan Sarya Ozgur, Elîşêr Dêrsîm, di şerê Til Temir da hevrêya me ya ciwan Îvana Hoffmann şehîd ketin.

Ciwanên ku di oxira gel da jîyana xwe ji dest dan bûn hêvîya azadîyê

Weke em dizanin dewletên mêtinger û emperyalîst her tim dixwazin hêza xwe mezin bikin û amûrên xwe yên hilberînê berfireh bikin. Ji bo vê yekê hemû sîyaseta xwe ya qirêj di mêjîyên ciwanan da ava dikin. Wekî ku me di destpêkê da anî ser ziman, ew dîroka ku bi hêz û keda ciwanan hatîye afırandin tirseka mezin berda dilê wan. Ji ber vê yekê hemû hewldanên xwe bi van rêbazan didin meşandin. Di destpêkê da xwestin ku ciwanan teknelojîyê ve girê bidin. Di heman demê da bi rêya dermanên hişbirî an jî bi vekirina derîyên koçberîyê xwestin ku hemû ciwanan ber xwe ve bikişînin û wan di welatên xwe da wekî hêza erzan a kar bikar bînin.
Hevrê Hakûr Hîlmarsonê ku ji welatê Nîw Zîlenda berê xwe da şoreşa Rojava û bû Şahînê Kurd. Hevrê Hakûr di şerê Efrîn da tevlî karwana şehîdan bû.

Stêrka Sor Hevrê Firat Newal

Hevrê Firat ji malbeteka Kurd û Ermen e. Qismek ji jîyana wî li Ewropayê derbas bû. Li Ewropayê tevlî nav refên Partîya Komunîst dibe û yek ji pêşengên ciwanan e. Di heyama ku dewletên emperyalîst û kapîtalîst ji bo ku gel û ciwanan ji şoreşê dûr bixin; derîyên koçberîyê vekirin, hevrê Firat berê xwe da şoreşa Rojava. Hevrê Firat ew jîyana Ewropa ya ku gelekî rengîn xuya dike û gelek ciwan dixwazin ku bijîn qebûl nekir û ji bo parastina nirxên vê şoreşê sînorên dewletên emperyalîst şkand. Di heman demê da cihê xwe di qadên çîyayên azad da jî girt. Piştî ku perwerdeyên sîyasî, bîrdozî û leşgerî dît derbasî Rojava bû. Di qada sabotajê da perwerdeyên pisporî dît û di gelek enîyên şer da cihê xwe girt. Wî bi sekna xwe ya xurt moral û manewîyateka xurt di dilê ciwanan da ava kir. Di dîroka 3ê Çileya 2023an da bi sûîqesteka nemirovî teva rêberê komunîst, fermandarê sor Ehmed Şoreş şehîd ket. Wî ji bo bilindkirina xeta komunîst û avakirina sosyalîzmê canê xwe fida kir. Her wiha rê li ber gelek ciwanan vekir ku bibin şopdarên xeta şehîdan û mîrasê ku şehîdan ji wan ra hiştîye.
Di her rûpeleka dîrokê de destana lêhengîya ciwanan hatîye nivîsandin ku ew bûne manîfestoya têkoşîna tevahî mirovahîyê. Teqez Em ê Ser Bikevin. Têkoşîn Didome û wê heta Serkeftinê Bidome.






# DIVÊ EM PRATÎKA XWE YA RÊXISTINÎ BIHÊZ BIKIN

Rêxistin, di raveka herî kurt û giştî da yekîtîya armanc, vîn û çalakîyê ye. Ew kombûna ji yekê zêdetir kesan e ku ji bo heman armancê tevbigerin. Ev dibe partî yan sendîka, dibistan yan artêş, kargeh yan şaredarî, milîs yan komîte. Cudabûna armanc û çarçoveya çalakîyan bi awayekî xwezayî dibe sedema cudabûna form û naveroka rêxistinan û cihêrengîya rêxistinê. Ji ber vê yekê, rêxistinên ku tevahîya têkilîyên aborî, sîyasî û civakî pêk tînin, cihêrengîyeka bêsînor nîşan didin. Rêxistin rewşa hevkarîya di navbera mirovan da ye. Kesên ku rêxistinê pêk tînin, di kirina "karekî" da bi hev ra ne. Ji ber vê yekê, di damezrandina rêxistinê da xala destpêkê pênaseya "kar" e. Kar çi qasî baştir were pênasekirin, ew qas rêxistin dikare baştir bixebite. Li gorî rêxistinê karek nayê dîtin, li gorî karî rêxistinek tê damezrandin. Bi tenê, xebatên çapkirinê bingeha hebûna çapxaneyê ye, karên werzîşê bingeha hebûna komeleya werzîşê ye, karûbarên perwerdehîyê bingeha hebûna koma xwendinê ye, karûbarên leşkerî bingeha hebûna rêxistinên leşkerî ne.

Pêşengê komunîst bi perspektîfa amadekirina şoreşê, hemû awayên rêxistinbûnê yên li gorî hewcedarî û hêzên amade yên têkoşîna sîyasî bi kar tîne. Bi rêxistinên cur be cur ra armanc dike ku kedkar û girseyên bindest di çeperên têkoşîna çînan da birêxistin bike û bi vê yekê ra hêzên partîyê jî xwe bi rêxistin bike. Yekîtî, komele, weqf û şebekeya hevgirtinê di nav formên yekem da ne, komîte, şane, koma xebatê û tabûr jî di nav formên yekem da ne. Rêxistinbûna girseyê û rêxistina pêşeng du astên rêxistinî yên bi wesfên cuda ne û ji ber vê yekê erkên rêxistinî yên cihêreng û formên rêxistinbûnê yên cihê ferz dikin. Lê belê, pêşketina şoreşgerî hewce dike ku ev her du astên cihêreng di heman pêvajoyê da bi hev ve girêdayî û bi hev ra bêne meşandin.

Hem rêxistinên girseyî û hem jî rêxistinên partîyê yên ku di têkoşîna çînayetîyê da radibin ser sehneyê, dikarin demdirêj û "daîmî-timî" bin an jî demkurt û "demkî" bin. Tiştê ku dîyar dike ku rêxistinek dê demdirêj be an jî demek kurt be, berî her tiştî armanc û çarçoveya xebata ku ew afirandîye ye. Şert û hevsengîyên heyî yên têkoşîna sîyasî, helbet mayîndebûn an jî demkîbûna formên rêxistinî dîyar dike. Komeka belavokan a ji sê kesan a ku ji bo belavkirina belavokan hatîye avakirin, mînakeka tîpîk a rêxistineka demkî ye. Partîyê komunîst a ku armanca wê serkeftina têkoşîna şoreşgerî ya desthilatdarîyê ye, ne bi wateya mutleq, di wateya jîyanê da rêxistina sereke ya "daîmî-timî" ye.


Di şert û mercên têkoşîna sîyasî da, armanc û çarçoveya xebatê jî dîyar dike ku rêxistin dê sade an tevlîhev, zagonî an nezagonî, berfireh an teng, nerm an hişk be. Hin rêxistinên zagonî yên fireh û maqûl ên ku pêşengîya komunîst dorpêç dikin , wekî hewzên girseyî yên şoreşger rola xwe dilîzin. Komên perwerdehîya herêmî yên bi avahîyeka sade û homojen di birêxistinkirina derdora partîyê da bikêr in. Komîteyên partîyê yên ku berpirsyarîya birêvebirina xebatên bîrdozî, sîyasî û rêxistinî yên enîyên ku tê da ne, divê bi disîplîneka pir hişk tevbigerin. Rêxistinên leşkerî yên sîyasî li gorî cihan diguherin; ji formên herî berfireh, wek tabûra şoreşgerî, heta bi formên pir teng, wek yekîneyên gerîla. Di guherîna şert û mercên sîyasî da, rêxistinên milîs dikarin bi pêkhateyeke sînordar a mîlîtanên komunîst ava bibin, an jî weke ku berxwedana xwerêveberîyê li Bakurê Kurdistanê nîşan dide, dikarin xweparastina gel li ser esasê çekdarkirina bi hezaran belav bikin.

Pêşengê Komunîst, ji bo serkeftina şoreşê bi mezinkirina Partîyê Komunîst û bi avakirina rêxistinên cûr be cûr ên girêdayî Partîyê dikare rêya sosyalîzmê veke, şoreşê bihêz bike. Ji bo vê jî pêwîst e her komunîstek Şoreşger, li ser vê esasê bijî, kar bike. Divê em pratîka xwe ya rêxistinî bihêz bikin, CKŞê mezin bikin!

# Gerek em xurt bin ne zeyif bin!

Navê min Lorîn e. Emrê min 20 sal e. Bajarê ku ez lê ji dayik bûme Hesekê ye. 4 xwişk û 3 birayên min hene. Dema şerê Surî da ku Idrîs Reşo şehîd ket ew çax dayîka min gelek ser me tirsîya ji bo wê em çûn Başûr. Emrê min ew çax 12 sal bû. Di destpêka ku em çûn rewşa me ne baş bû, demeka baş derbas bû qeza bi min ra çêbû û feqerê pişta min ji hev dûr çûn. Bavê min ji ser amûd ket, me serê wî dirût. Lê kes bi me ra tune bû, dayîka min û xwişka min dest bi karê paqijîya malên dewlemendan kirin. Ez zarok bûm min kar nedikir. Xwişkên min li mehmelê kar dikirin. Em hatin Rojava min li ser sînor heval dîtin. Kêfa min ji wan re hat. Min li Rojava ji refa 9 heta 12 xwend lê ji bo min gelekî zehmet bû. Ji ber ku min nexwendibû. Ji ber vê min 2 sal xwend û em çûn Başûr û êdî min nema xwend. Ji bo ku pereyê bavê min tunebû min dev ji xwendinê berda. Min dixwest hevalên min hebin, min dixwest ez herim û werim, mala me. Yada min, yanî dapîra min nedihişt. Bavê min jî digot ew pîrka te ye çi bêje ew rast e. Yada min digot çênabe keçik derkeve, gelek di mala me de mudaxele dikir, li cem mala yada min keçik û xort ne wek hev in her yek şikileka. Xort çêdibe bişuxulin, bes keçik çênabe. Gerek xort herin û werin û kesek tiştek nebêje, bes em keçik çênabe. Gerek herkes mudaxele bike. Ew dîkarin li derve razên, ew çi bikin normal e lê ji bo me keçikan eyb û qedexe ye. Min dixwest ez bikevim nav hevalan lê bavê min digot çênabe keçik di nav karê leşgerî da be.

Min dixwest ez valatîya di jiyana xwe da tijî bikim. Lê digotin çênabe em derkevin, şerê me her tim ji bo ve ye. Ez carna dibêjim ez dixwazim herim bigerim dibêjin bû êvar çênabe. Li cem wan a herî girîng gotinên xelkê ye. Hûn keçik in wê xelk li ser we biaxivin. Ez 14 salî bûm min hîcab danî. Ez dihatim ber neynikê min digot ez ê xwe derman bikim, digotin na eyb e. Ez zarok bûm xwişka min porê min çêdikir şer dikirin û digotin çima tu wê xweşik dike, ev tişt çênabe. Digotin ji bo ku xort li te binêrin tu xwe xweşik dikî, lê wê demê ez zarok bûm ez 12-13 salî bûm. Gelek cil û bergên min hene lê nahêlin ku ez li xwe bikim. Dibêjin kin e, gerek tu tiştekî dirêj li xwe bikî. Carekê min cixare vedixwar birayê min gelacîya min kir û bavê min hat li min xist. Carekê jî min xwe emelî kiribû, bavê min û dayika min şer dikirin, min jî xwe xist nav wan, min got bes şer bikin dehfek da min û bi min ra şer kir. Got çênabe tu biaxive, ne karê te ye. Dayîka min her tim dibêje dengê xwe ser birayê xwe bilind neke. Ew çawa bike û çi bike çênabe ez dengê xwe hildim. Mînak ku xortek were ba me, mala me çênabe em keçik ji odeya xwe derkevin. Çênabe em pê ra rûnin, heta ku ew mêriv be jî. Çênabe em derkevin cedê û hîcab ne li serê me be. Wexta em derkevin baxçeyê ya derekê pêwîst e yan dayik yan jî birayê me bi mere be. Em tenê çênabe derkevin. Ez dibînim derdora min gişt dirin û tên û mala wan tiştek nabêjin. Lê em çênabe. Birayê min karê ragihandinê dike ez jî gelekî dixwazim karê ragihandin bikim, lê li cem mala me çênabe, ez keçik im eyb e. Min dixwest ez herim tevlî bibim lê dayîka min nexweş e ez ditirsim tiştek lê were. Ji ber ku malbat wê zanibe û loma giştî ji min bikin. Wê bêjin te wê baş xwedî nekir, ev terbîya te bû. Bavê min gelekî bi dayîka min ra şer dike ku çima te ev xwarin çêkiriye û çima te ev kar nekiriye. Ez zanim gelek wek min hene lê her yek ji me êşa xwe tenê dibîne. Ez dixwazim ez û keçkê wek min malbatên me azadî bidin me û bihêlin em jiyan bikin em herin û werin. Gerek em xurt bin em ne lawaz bin. Pêwîst e em rehetiyê bibînin, ez dixwazim em û xorta weke hev bin. Malbata me, ji destpêkê gerek e xort pera bînin û kar bikin û keçik tenê li mal bin û xwarin çêkin. Ev pêwîst dibe were guhertin. Niha em dibînin heval li cem me ne û ji bo me şer dikin. Me dît gelek jinên ciwan karê leşgerî kirin û kar kirin. Me fêm kir ku jinên ciwan jî dikarin derkevin ,ew û xort wek hev in, gerek em her kes wilo bibin. Pêwîst e em giştî vê tiştî nas bikin û em bibin wek hev.






# *Rêya Me Rêya Nemiran e, Em Bi Navên Wan Dijîn!*

Dibe ku, ji roja ku mirovan mirin fêhm kirine heta niha bêmirinî di rojeva mirovahîyê da be. Di destana herî kevin a nivîskî ya mirovahîyê ‘Destana Gilgamiş’ da, Gilgamiş dikeve pê nemirîyê lê mixabin li hemberî marekî, dermanê nemirîye winda dike. Piştî wê jî Luqman Hekîm li dermanê jîyanê digere, ji mirinê ra çareserî peyda dike. Lê mixabin, bayek radibe û pelikên ku Luqman Hekîm dermanê nemirîyê li ser nivîsandîye difirîne û dibe. Her çi qasî ev mijarên ku me heta niha behsê kirine çîrok jî bin, ji bo ku em lêgerîna mirovahîyê ya li jîyaneka bêdawî baş bînin ser ziman mînakên xweş in.
Em dikarin bêjin hîna îro jî mirovahî li pêy nemirîyê ye. Hindek mirov tevahîya jîyana xwe bi tirsa mirinê û di nav lêgerîna nemirîyê da derbas dikin. Ev cureya mirovan difikirin ku wê bi perê xwe jîyanê bikirin. Wekî ku ji jîyana mirovan bidizin, ji bo ku emrê xwe dirêj bikin ji keda wan didizin û dixwin. Rast e burjuvazî ji jîyana kedkaran dixwe, lê careka din jî ji mirinê nafilite. Bêgûman li ser rûyê cîhanê hemû zindî di pêvajoyekê ra derbas dibin. Dest bi jîyanê dikin, dijîn û dimirin. Lê dema em behsa nemiran dikin, em dibêjin ku ew bê mirin in. Çima? Ji ber ku bi rastî jî li ser rûyê vê cîhanê tu tişt tune nabe, tu tişt jî ji tunebûnê çênabe. Dema ku mirovek ji bo şoreşgerîyê ango komunîstbûnê biryar dide gavekê ber bi nemirîyê ve davêje. Ji bo jîyaneka bêsînor, bêkedxwarî, azad, birûmet, bieşq û wekhev ava bike dest bi xebatê dike. Di vê oxirê da her gava ku davêje, her kevirê ku datine li ser yên din wê-wî ber bi nemirîyê ve dibe. Wê-wî di dil û mejîya mirovan da mayinde dike. Ew bi jîyana xwe, bi lêgerîna xwe ya avakirina mirovê nû gav bi gav nirxan diafirîne. Bi van nirxên ku bi jîyana xwe diafirîne, nemirîye heq dike û bi şehadeta xwe jî nirxeka bipîvan dîyarî mirovahîyê dike.

Hevrê Elende ango Zîlan Destan, bi şoreşgerîya xwe ya têr û tijî, bi ciwantîya xwe û wêrektîya xwe bû minakeka herî zelal ya jîyana şoreşger. Hevrê Zîlan wek jineka ciwan ê ji bajarê Kobanê, dema ku Partî nas kir, rasen berê xwe da Partîyê. Ji hevrêyên ku çûbûn serlêdana malbata wê re eşkere got, “Di vê malê de yê ku dixwaze rêxistin bibe ez im, ez dixwazim beşdarî Partîyê bibim.” Û heta talîya emrê xwe jî bi vê xwestekê şorşgerî kir. Bi armancên xwe ra, bi partî û hevrêyên xwe ra pir girêdayî bû. Wek jineka ciwan, malbat û eşîr wek astengî li pêşîya şoreşgerîya xwe nedît û bibiryar rêya şoreşger da pêş xwe. Di demek kurt da berê xwe da çîyayên azad ên Başûrê Kurdistanê. Li Akademîya Hûseyîn Demîrcîoxlû ya MLKPê perwerdeya xwe ya bingehîn stand. Piştî perwerdeya xwe ya bingehîn berê xwe da Şoreşa Rojava û bi erk û berpirsyarîya pêşengtîya ciwanan rabû. Hevrê Zîlan di her qadê da bi hêz û zîrektîya xwe, bi rihê xwe yê ciwan bû mînak. Rê li pêşîya jinên ciwan vekir. Zincîrên eşîr û malbatê şkand. Û wek şehîdê yekemîn ê ji Rojava ya MLKPê navê xwe li ser pelên dîrokê û nemirtîyê nivîsand. Niha dema ku em behsa nemirîyê dikin, em bi hemû dil û mêjîya xwe jê bawer in ku yên di rêya rûmeta mirovahîyê da, di rêya azadî û sosyalîzmê da jîyana xwe ji dest dan, tu carî namirin. Ji ber ku armanca wan dijî. Ji ber ku ew di têkoşîna me de dijîn. Bi fikrên xwe, bi navên xwe, bi dengên xwe, bi şopên xwe... Ew her hene. Em wek Ciwanên komunîstên Şoreşger ên Rojavayê Kurdistanê di her gava ku davêjin da hesab didin Heval Baran û Heval Ehmed. Her karê ku em dikin, em bi heval Zîlan û heval Metîn ra dikin, ew rê nîşanî me didin. Îro ji Rojavayê Kurdistanê heta Ewropayê navê Şehîd Baran, Şehîd Elîşêr, Şehîd Berçem, Şehîd Destan û Şehîd Zîlan hatîye dayîn bi dehan zarokan. Îro li gelek çeperên berxwedanan, şoreşger û komunîstan navên wan rakirîye û bi navên wan dijîn. Kî dikare bêje ku bêmirinî tune ye? Kî dikare bêje ku ew mirine? Ew her tim bi me ra ne, me fêr dikin, rêya me ronî dikin. Şehîd misogerîya serkeftina sosyalîzmê û rizgarîya mirovahîyê ne!



JI PAYIZEKA BI PELÊN XWE YÊN HIŞK

KU JI ÊŞA HAVÎN U ZIVISTANEK LI XWE GIRTÎ

HEMU XEYALÊN MIN DORPÊÇ KIR

LÊ WÊ BIHAR WERE

Û RENGÊ XWE YÊ KESK DARA MIRADA MIN KESK BIKE

WÊ DENGÊ DILŞADÎYA MIN EZMAN BIXEMILÎNE

WÊ GELÎYÊ ZÎLAN JI NÛ VE SERÎ RAKE

WÊ ZÎLAN Û JÎYAN  XWE BIKIN XEMLA AZADÎYÊ

WÊ AVAŞÎN RENGÊ XWE CAREKA DIN LI XWE BIKE

WÊ AWAZÊN ZAP Û METÎNA TACA PAYABÛNÊ LI XWE BIKE
Û EZ Ê BIBIM XWEŞÎYA DILÊ KEÇ Û XORTAN

